

Qamişlo...zoranbazî ya viyanan serî dikşîne



2 « Bo her rewşek ê karek pêwîste

3 « Belavbûna Zimanê Kurdî yê Coxrafî

3 « Kevalên azadî yê bi hest û tilî yên semer dirêhî

4 « Kurd – Regez û Ziman di dîrok de

Berpirsyarî

Kêşedoza berpirsyarî yê hatî ye girêdan bi pirsgirêk a azadî ya raman ê ve ,ji ber ko berpirisyarî û azadî hevdu tekûz û serrast dikin, dem a ko mirov azad be, dêmekî dikare ko berpirsyar be jî ji ber ko dikare hemû şîyan û karîn ên xwe pêkbîne û biçespîne di warê hevkarî û kargêran a civak û qat û çîn ên karli dar û destbikar de . berpirsyarî li ser sê bengêh ên serekî avadibe: 1- azadî ya sewdan ê mirov ê berpirsyar ji hemû birtiskî yên rewşenbîrî çî li ast ê civakî û çî li ast ê siyasî. 2 – behwermendî bi kêşedoza a netewî dem a ko gelek hatibe dagîrkirin ji hemû alîyan û layinger ên şêberî û razberî ve, çî xak û qad û çî raman û rewşenbîrî ya netewî, û rizgarkirn a mirov ji tor û dahfk ên saxtekarî yê .3- livlivîn a kar û xebat ê ji bo bi kar anîn a hemû pêzanîn û zanyarî yên bingehîn û serdest, da ko hest û hizra netewî têkeve kiryar a danûsitin ên civakî û siyasî û wisa ewê jîn û jiyar û dîrok û ranyarî wê bibin yek komerîşk di pêk anîn a armanc ên netewî de, ev kiryar a girêksaz jêre tê gotin berpirsyarî dem a ko mirov ê welat parêz xwe bide pêş .

Qamişlo...zoranbazî ya viyanan serî dikşîne

loloxan

Qewmana Qamişlo di rêzbenda bûyer ên sores aSûrya yê da westgeheke serekî ye ji ber kodikeve war ê pîlangêrî yê li ser rojava yê Kurdistan ê, ew pîlangerî ya hatiye rist û hûnan di nav a tariya navend ên nejad peristî ya erebî de, wa diyare ko qewman a Qamişlo rûdaye jib al sê rehînd ên bingehîn ve: 1- ne amadebûn a tevger a rizgarîxwaz a kurd ji şoreşêre çî ji layê sitratîcîve û çî ji layê karname ya rojevê ve, û di heman wêstgeh û helwest ên siyasî de çî ji destpêk a livlivîn a şorişgerî ve û çî di rêzbend a qûnax ên serekî de di navber a ew xwepêşandan ên cemawerî da li ast ê dever a cugrafî û navtax a siyasî û rewşenbîrî de da ko kolan a kurdî bîrûboçûnek e xwenî bingehîn saz û tekûz bike li himberî dijberî ya erebî ya surya yê, lê mixabin ew tînerîn a siyasî ne çû serî di gel hemû bizav û livlivînên navxoyî û navherêmî de, ji ber ko nakokî yê partîxwazî û kesokî zor rolêd wan hebûn û hîna jî

hene li ser nebûn a yek helwêst û yek nerîn di der maf ê berjewendî ya netewî de. 2- paşguhkirin a dijber ya erebî ji kêşedoza kurdî e ji ber ko sewdangêrî ya nejadperistî rê nade tînerîn ên welatparêzî û danûstan ên siyasî da ku rêkeftin çêbibin bo kiryar a şorişgerî tîkeve ser rêçxank a şoreşê, lê ne amadebûn a tevger a rizgarîxwaz û helwêst ên nejadperistî jibal dijberî ya kêşedoza kurd li rojava yê Kurdistan ê dapaşî û xiste qeyran a hebûn û ne hebûn ê û wisa kêşedoza li çar rêyanan rawestîya, li hêvî ya livlivîneke iyasî berdest û tîgîhiştî da ko ji nûvde tirên a şoreşgêrî tîkeve ser rêçxank a kiryar a kar bi dest û dest bi dar, da ko qewman a Qamişlo li ser ê gel ê kurd ne gere û nebitin pîrsgirêkeke dîrokî, 3- tevlihevî ya navnetewî-bi nebûna helwestekî rast û ron bi bal sores a sûrya yê ve bi giştî û kêşedoza kurd ve bi taybetî ew helwêst ê ko gelek dîwar avakîrin e li pêşî ya sores ê û ber ê wê



daye cengeke reşkuj û wêrandar û herfandin a avahî û avaniyan û pêşelkîrn a rewîşt û siçî yê mirovayetî û berbor û nerît ên civakî û qeyran û tîkçûn a rewş a aborî û bi giştî jêrxan û serxan a welatparêzî, dîmekî qewman a Qamişlo tevli ewan hemû qeyran û tengejeyan dibitin wisa alozîyan gurîxdike . ev hersê rehînd cemserkêşaneke gelêrî bi darxist li gorepan a livlivîn a gorepan a şoreşgerî komerîşkek ji pîrsyar û

têbîn ên rexne lîgirtin hildan û vedan li ser hemû astên kêşedoza kurd de dîmekî gel û tevger û dijberî di qeyran a taqîkîrnê de ne çî tîgîhiştin û erk hilgirtin û çî encam karî, qewmana Qamişlo waneyeke dîrokî ye û westgeheke berpirsyane ye li pêşî ya tevger a kurd ya rizgarîxwaz da ko da-keve gorepan a çareserî ya netewî bi vîyaneke berpirsyar û zoranbazî ya viyan ên berjiwendigîr

Bo her rewşek ê karek pêwîste

Lawkê Hacı

Her wekû hatiye gotin ji mîjde û li ser ziman ê bav û kalan, bi taybet di warê civakî de li dem a ku kesayetîyek yanjî malbatek yan netewek raserî rewşek a ne sîruştî bibe, li gor ku li ser ziman ê wan hatiye gotin bo çareserî ya ewê rewşê, dibêjin carna jê alozî bi zêr çareser dibe û carna jê bi zanebûn ê û car caran zor tê xwestin, başe eger em bîn û temaşeyî rewş a gel ê xwe yê kurd bikin li Kurdistan ê herêm a rojava di evan bûyerên nazîk û talûke û bi lez ku li sûrya yê rûdidin, ku gel ê me yê kurd bi giştî azar û zehmetîyek a zor dibînin di biwar ê jîyan a rojane ji layê aborî ve, ew laşê ku tê naskirin bi tevger a kurdî li herêma navbirî, tevgerêke bê hêz û qels û perçekirî ye û dijberî li navbera wan her li badîbe, ev rewş bûye eger ê ku çî giranî ya gel ê kurd hîç bi rengêkî ji rengan di dîmenên evan bûyerên li sûrya yê rûdidin hebe, rewş ya pîr xirabe û encam dê çîbin zehmete bi hîsanî were nêrxandin ji ber pîr li hevketî ye û gelek dest yê derveyî li paş rûdanên sûrya yê heye, eger kar ev karbe û gel ê kurd di nav van bûyeran û guherînan di vî sergêjek yê de bimînin, gelê kurd çî bi dest xwe ve nayne , ev rewş mina sawêr ê dêwayê pîr bi tîrs û talûkeye li ser giriftiyar a gel ê kurd bi taybet li ser ast ê

netewî, ji ber evê rewş a bi vî şeweyê han kurd nikarin li ser ast ê xalek ê bi tenê karbîkin da ku xwe verisbîkin û çareserîyan deynin , ji ber ku di rûdanin wesan de pêtivî bi hersî xalên li destpêkê me amaje pêdaye heye, zêr -zor - zanebûn- eger bê û em bêjin ku li ser astê aborî hêvî heye û ya hêjaye , ew hêvî yah eye bo çareserî ew hêvî neku peydadibe li cem me weku kurdên Kurdistan ê herêma rojava , lê ji layê xemxurekî kurdeyatîyê ye ku amadeye ta domahîyê pişt û alîkarbe bo bi dest ve înana maf ê gel ê kurd li sûrya yê, lê herdû xalên din wê çawa çareserî jêre were dîtin, zor - zanebûn, ku ev herdû xal pitir ji tevgera kurdî wek ku ew xwe bi nav dikin , lê mixabin û sed mixabin ku ya diyare ku ev tevger ne li gor wî astîne û ne li gor berpirsyar ya vî pêvajo yê ne, li vîde ez di wê baweryê dame ku ev erk ê han divêt wekû millet li xaçîrêkan bigerin û evan herdû xalan bixin di war ê pîratîkî de, eger hat û millet ê me ji nikarîbû bi evan karan rabin û qurbanîyan pêşkêş bikin û li hev xwedan derkevin, dê ev keys a zêrîn ji dest me kurdan biçe , bawerbike kurdo piştîre poşmanî nema çî sîdê dida û ya di dest mede bimîne bi tenê , wê sitran a eysan a elî lê wayê û her û her lê wayê.



Belavbûna Zimanê Kurdî yê Coxrafî

Li ser herêma coxrafî ya ku Kurd li ser dijîn, Mîrê Bedlîsê, dîrokname bi nav û deng ê Kurd Serefxan, di şerefnameya xwe de wiha dibêje: "Hudûden welatê Kurdan, ji peravê Derya Hurmuz (Delavê Basra M.E.B.) ya ku ji okyanûsê vediqete dest pê dike, li ser xeteke rast ji wê derê heta dûmahîka welayetên Meletiyê û Merasê diçe. Bi vî awayî aliyê bakurê vê xetê Fars, Iraqa Acem, Azerbaycan, Ermenîstana Piçûk û ya Mezin pêk tîne. Li başûrê ve xetê ji Iraqa Erebî, Musil û Diyarbekir heye. Tevî vê ji gelek xelq û qebîlên ji nesla van însanan, ji rojhilat heta rojava li gelek welatan belav bûne." (1) Roja îro, Kurdî li Asiya Piçûk, erdê navbera Anadolîyê, Kafkasyayê, Faris û Erebî tê axaftin. Li rojava Tirkî, li bakur Ermenî, li bakurê rojhilat Azerî, li rojhilat Farisî û li başûr Erebî dibe cîranê vî zimanî. Axa Kurdistanê îro hatiye perçekirin û ketiye nav hidûden Îranê, Iraqê, Sûriyê û Tirkîyê. Li gorî vê, rojava û başûrê rojavayê Îranê, seranserî bakur û rojhilatê bakurê Iraqê, bakurê Sûriyê û rojhilat û başûrê rojhilatê Tirkîyê welatê eslî nê



zimanê Kurdî ye. Civakên Kurdî-îaxêv her wiha li Ermenîstanê, Turkmenîstanê, Pakîstanê (Belûcîstana Pakîstanê) Afganîstanê, Hîndîstanê û Lubnanê hene. Li paytext û bajarên wekî Horasanê, Tahranê, Bexdadê, Şamê, Ankarê, Îstebolê, Konyayê û Îzmîrê ji nifûseka kesîf a Kurdîaxêv heye. Tarîxa bicîhbûna Kurdan a li van welat û bajarên ji alî hin Kurdan ve gelek kevn e, diçe bi sedsalan berî niha û ji alî hin Kurdan ve ji dikeve nav sedsala me ya nuha, bi taybetî ji van deh dawiyê. Ku di van salan de yan hatine sirgûnkirin, yan jî ji ber zilm û zorê ji mecbûrî barkirine. Bi vî mahnê, li welatên Ewropa.

li Amerîkayê, li Awustiralyayê jî li ser hev nîv milyon Kurd hene. Heke em bixwazin hidûdê welatê eslî nê zimanê Kurdî destnîşan bikin, em divên tabloya jêrîn diyar bikin: Li bakur, li Ermenîstanê ji Lenînekanê destpêdike ber bi rojava de bajarên Qersê, Erzurumê, Erzincanê, rexê rojhilatê bajarê Siwasê û qeza Sarizê ya Qeyseriyê digre nav xwe. Pişt re dikêşe û Merasê, Qirixana Hatayê jî digre di wir re ji hidûdê Sûriyê û Tirkîyê dibuhure diçe herêma Afrînê (Çiyayê Kurmênc) ya li Bakurê Helebê. Afrînê digre navxwe û ber bi rojhilat diçe; Kebaniyê (Ayn Ereb), Serê Kaniyê (Rasul Ayn), Dirbêsiyê, Amûdê û Qamişliyê digire. Piştî

Dengê kurd

ku hemû herêma Cizîrê ya li Sûriyê girt ber xwe ber bi basûr de rex bi rexê Dicle dadikeve Musilê, çiyayên Sincêr, qunatrên başûr ên rêzeçiyayên Hemrîn digre nav xwe, li hundurê Iraqê li başûr ta digihîje herêma Tirkîtê. Li wir Mendeliyê, û çiyayê Piştikêw digre, dikeve hidûdê Îranê, li wir digihîje başûrê Loristanê ku ji Piştikêw, Pêşkêw, Balagrêwe, Bextiyar, Kahgehî û Momesanî pêk tîne. Ji bakur ber bi rojhilat de, gava ber bi basûr dadikeve, hidûdên zimanê Kurdî, peravê rojhilatê çemê Erez, li Îranê Makû û Xoyê û peravên rojava û başûrê Gola Urmiyê, çiyayê Sehendê ku dikeve bakurê Merexê digre nav xwe. Ji wê derê bi zikzakî diçe û Ahmedawa, Mesîrabad, Bicar (bajarê Kurdî yê paşîn yê li rojhilata bakur) digre ber xwe, ji gund û qesbên Esedayayê derbas dibe ku ev bajar dikeve rojavayê Hemedanê, pişt re dirêj dibe heta Karêzê, Alî Çadderê û Şar Kurdê ku ev bajar li rojavayê Îsfahanê ye. Ji wir ber bi başûr de dadikeve û digihîje bajarên Kûzeyrûn û Hesarê

Kevalên azadî yê bi hest û tilî yên semer dirêhî

Dengê kurd

Nîgarkêşa kurd semer dirêhî pêşangeha kevalên serpêç û azadî xwaz li hewlêrê pişkûrîn kir, ev pêşangeh ji bîst kevalên hemereng pêkhatiye, çendîn ji wan kevalan jin tîde şilfî laş bûn wa diyare ko mebesta nîgarkêşê ewe ko mirovê kurd li jinê dinêre bi çavê ganûgon, ne wekî mirovekî wekhev li gel mêrê serdest xwedî biryar. û li rexekî dîtir çendîn kevalên reng vemirtî hatibûn nîgarkêşan bi mijlêvedanê da ko rewşa jinê bête eşkerakirin ko civaka kurd hîna ne xwedî helwestekî rastûrone li ser rizgarkirna cîhana jinê ji hemû berbor û neritên çewt û serhevedar, da ko rexnelêgirtin karigerbe û cihê xwe çêke di swedanê mêrê desthelatdar de. û li rexekî dîtir çendîn kevalên gewrebor hatibûn pêşankirin di wan de jin dibin zordarî û

sitemkarî ya mirov de dijî bi kar anîna alavê çakûç û bizmaran di serî de, ew qêrîna gazî û hawarxwestinê ji bo rizgarkirinê û azadî ye. û li rexekî dîtir kevalên cora û cor dayka kurd pêşandikin ko ew bê pare ji mafên jin û jiyarê û hindek kevalên dîtir keça kurd pêşandikin ko rastî xizîya evîne bû ye û xem û azaran ew girîtiye û wisa li alîkî dîtir semer ciwanî û bedewbûn a keça kurd di de pêşandikin dema ko wê di gel kevokê nîgarkêş dike wê gavê du mebestan bi cih tîne (evîndarî - aştxwazî) di cîhana mênaza kurd de, û wisa semer dirêhî di cîhana nîgarkêşanê de perwazên qêrîna jina kurd vedide ko mafên mênazî yê bi dest ve bine û li nik mêrê kurd pêkbîne û bi çespîne di nava ew reng û xêzên devkîlîk û destbidar.



Semer dirêhî

Hevrêzgeha keça kurd êvarsazî yeke helbestî-dengbêjî li darxist

Bi amadebûna cemawerekî pir bi coş û xiroş li girkê legê ji hemû qat û çînen civakî û navtaxa roşenbîrî ue hevrêziya keça kurd êvarsazî yeke helbestî-dengbêjî li daxist li hola Encûmena niştimanî ya kurdî , êvarsazîyê destpêkir bi pişkûrîna sirûda niştimanî û paşra çend helbestên kilasîkî û nûjengerî hatin xwendin ji bal herdû berebavên navoser û nûhatî û di navre çend birgehên dengbêjî hatin pêşkêşkirin jibal koma zêwa û koçka mihemed şêxo . Hêjayî gotinê ye ko Hevrêzgeha keça kurd hatiye damezrandin li jêr karîgerî ya şoreşa sûriya yê .



Êvarsazî yeke sazjenîne li şêranê

Dengê kurd

Di navbera çalakî yên partî de li şêranê roja 9/4/2013 Êvarsaziyeke sazjenî Nhatê li darxistin li mala (mistefa omer) bi amadebûna saz-bendên tembûrê ev berêzin (rizgar, xebat , heval , ferhad) ev Êvarsazî bi sirûda niştimanî (ey reqî) destpêkirû wisa jenînsazî yê xweberda nava ahengsazî yê bi alîkariya dengbêjî ya çend sitranên filklorî û tazenzaz bi jenîneka dîlkêş jibal jenînsaz ve û wisa evê êvarsazî yê dirêjkir di gel hevkarî ya çend guhdêrên tégihjştî di warê saz û awaz û jenîne de û li dûmahîkê ew êvarsazî hate zergeşandin bi jenîneke taybet ji bal heval selîm ve.



Kurd – Regez û Ziman di korname ye kê d e



Xatûn (Şêrîn M. Remedan) korname yek pêşkêşkir li hola pak-rawan li Dêrikê bi hevrêziya hevgirtina jinan li jêr nav û inşanê (Kurd- Regez û ziman) kargêra navhatî regez û zimanê kurd da pênasîn bi jêwerîn û tînerîna çend vekolkar û dîroknasên cihanî wekû (mînoriskî , lazarêf , lîrx , Emîn Zekî) ewên ko tekezkirin di pertûkên xwede ko kurd dêrîntrîn milete di rojhelata navîn de û Kurdistan xaknişînê yekemîne ji neviçirka mirovayetî ya duwemîn re , û kurd ji berebanga dîrokê ve li çiya yê zagrosê nişteci bûye wek (lolo , Gotî , kaşî) û wisa xatûn Şêrîn da xuyanê ko zimanê kurdî ji çar şewezarên serekî pêk hatiye (Kurdmancî , Soranî , Goranî , Lorî).

Derçûna Xuleka tîmarkarî û gazîhatina yekserî

Dengê kurd

Di hembêza suruşta gundê(babasî) de rêx-istina tirbesipiyê ya partî bihevrêzî di gel rêx-istina aliyana ya partiya demokrata kurd li sûriya yê (partî) ahengsaziyek bi helkeftina derçûna nîfşeke ciwan ji zerî yên kurd di xula tîmarkarî û gazî hatina yekserî deli darxist bi amadebûna şandek ji serkirdayetî ya partî û cemawerekî berbiçav ji heval û dilxwazên partî û rêbaza barzanîve , û li paşre hevalê serkirde xelîl ibrahîm tekezkir li ser rola jinê di civakê de û pêdiviya pêdana rêvekirinê li pêşiya wê da ko derbasî gorepana kar û xebatê bibe di hemû waran de çî li astê ramiyarî û ragehandinê û çî li astê rêx-istinên jinkarî yê .

